Lênihêrîna ewilî gelek caran wek ‘deriyê pêşî’ yê xizmeta tendûristî tê nirxandin.  Di nav civaka xwe de, pêşnîyaza tenduristî, tedawî û rêveberîyê dide nexweşan.

Lênihêrîna Ewilî wiha ne:

- Dermansazên Civakê
- Diransaz
- Optometrists
- Resepsiyonîstên dixtor/GP
- Hemşîreyên dixtor?GP
- Fizyoterapist
- Karmendên Pêywîstîya Derûnî
- Navenda Lênihêrîna Seretayî yên Acîl

Her endamêk ekîba Lênihêrîna Acîl di qadên cuda da xwedî jêhatîbûn û tercube ne, vî awayî hûn dikarin ji pisporê xizmeta tendûristî ya rast, cara yekem piştgirîya rast bistînin.

Ji bo dîtina Xizmetên Lênihêrîna Acîl yên NHSê yên herêmî serdana cavuhb.nhs.wales/primary-care-services  bikin an jî li jêr, koda QRyê binêrin.

Primary Choice leaflet KURMANJI 3-24

Ji bo pêdivîyên xwe yên tendûristî, bi dîtina kesê rast, di cihê rast da, cara ewil, hûn dê tedawîya herî guncaw bibin.

Hûn heger ne bawerin ji bo hewcedarîyên we ka kîjan endamê tîma lênihêrîna seretayî kesê herî baş e ku bibîne, ji kerema xwe serdana cavuhb.nhs.wales/primary-care-services bikin.

Hûn dikarin xizmetên xwe yên Lênihêrîna Seretayî ya NHSê ya herêmî jî bi amûrên me yên lêgerînê yên kêrhatî de bibînin.

**#WeArePrimaryCare**

**NHS 111 Wales**

Heke hûn ji delilên xwe ne bawer bin û çi piştgiriya ku ji we re lazime, hûn dikarin NHS 111 Wales online an jî  ziyaret bikin

cardiffandvaleuhb    @CV_UHB

# PrimaryChoice

## Tîma We ya Serekî Lênihêrîna

Tîma we ya tenduristîyê ya civakê ku bi piranî wekî tîma we ya Lênihêrîna Seretay tê zanîn, ji bo pêdivîyên xizmeta tendûristî di civata we da serdana we ya yekem jibo bangewazîyê ye.

GIG CYMRU NHS WALES
Bwrdd Iechyd Prifysgol Caerdydd a’r Fro
Cardiff and Vale University Health Board



## Eczaneya civakî



Eczane ya herêmî pir tiştên din jî dike ango ne tenê belavkirina ilacan. Ji bo mijarên kêm, êş, ilac jî dikarin tewsiye bide.

Dermansazên civakê dikarin ji bo nexweşiyên pirane tedawiya NHS'ê ya belaş peyda bikin û dermana nivisi bidin.

## Diransaz



Diransaz, eger êşa diranê te hebe, an ji xirtik jî bixwîn be, diranê aqilê bi zehmet, hesasîyeta diranan an jî cûreyên din yên êşa rû, kare alîkarî bike.

## Optometrist



Optometrîstek ku wekî optîyonên we yên li kolan/ bazar tê zanîn, dikare ji bo hewcedarîyên tendirûstîya çav, jibo wek pirsgirêkên dîtina we, êşa çavan an jî birîndarîya we, şîret û piştgirîyê bide.

## Dixtor ya te /GP



Wexta hûn bi dixtor/GP ra têkilî datînin, pêşî hûn bi resepsîyonîstekî ra diaxivin. Ji bo ku hûn hewcedarîyên xwe binirxînin û bigihînin pisporê xizmeta tendûristî ya rastane, wan perwerde kirîye ku pirsên veşarî bipirsin.

Di gel dixtor/GPyê we da, tîmeka pisporên xizmeta tendûristî ku warên cuda da pisporin ku şîret û tedawîya herî baş bidin we.

## Hemşîreya pratik



Hûn serdana Hemşîreya Praktîka Giştî bikin jibo; lênihêrîna birînan, şêwirmendî û nirxandinan, ya muafiyet, çavdêriya xwîn û nirxandinên nexweşiyên kronîk wekî asthma û diyabetê.

## Fizyoterapist



Fizyoterapist eger êşa we ya movik an jî masûlke hebe dikare şîret û tedawîyê pêşkêş bike.

## Karmendê Peywendiyên Tendirûsti ya Derûnî



Karmendên têkiliya derûnî li cerrahîyên dixtor/GP'ê de dixebitin.Ji bo hewcedariyên tendirustiya derûnî,

## Navenda Lênihêrîna Sereta ya Acîl



Dibe ku hûn ji hêla resepsîyonîsta dixtor/GP'ê ve werin şiyandin jibo navenda lênihêrîna serekî ya lezgîn.

Ev navend, jibo dixtor/GP kapasîteyeka zêde dike ku; ji bo ku hûn bikarin bi lezgînî xwe bigihînin lênihêrîna lezgîn.

## Dixtor/GP



GP ya we ji bo hin şertan dikare şîret û tedawîyê pêşkêş bike. Ev, bi piranî dê bibe nexweşên ku herî qels, tevlihev û pir nebaşin.